# Agahdarî! Jehrîbûna bi kumikan!

Bijîjkên elman hoşyariyê didin, ku kumik neyê danehev bo xwarinê. Sedem jî ew e, ku gelek reng ên kumikên jehrawî, li Elmaniya hene, mîna rengê kumikên li welat ên din têne xwarinê. Di encamê de, penaber van kumikên amanît yên gelek metirsîdar kom dikin. Metirsiya mezin di wir de ye, ji ber tu tameke taybet nade û nîşanên wê piştî çend saetan ji xwarinê xwe didin der.

<u>Şîreta me ya lezgîn:</u>

 Daneheva kumikan bo xwarinê qet nekin, bitaybetî, dema hun baş di nasîna wan de neşareza bin.

 Ew kumika ku li welatê te, xwedî tameke xweş bû dikare li vir kujer be.

 Eger guman hebe ku tu bi jehriyê ji ber xwarina kumikan ketibî, di cihê cih de, berê xwe bide nexweşxaneya herî nêzîk. Jibîr neke, tişta ji ber xwarinê mayî, an jî tişta we di devê xwe re avêtibe (verîşandin) bi xwe re bibî. Ev naskirina çeşîtê jehrîbûnê dermankirinê asan dike.

 Van agahiyan ji rûniştiyên penahxana (Kamp) xwe re vebêje. Vegotin jiyana gelekan ji mirinê azad dike!